MAHSÛM DÎMA

# Dema çav ji evînê dûr ketin



AZAD

# Dema çav ji evînê dûr ketin

**DEMA ÇAV JI EVÎNÊ DÛR KETIN**
Mahsûm Dîma

**Helbest:** 01 / 20

**Gerînendeya Weşanê**
Eslîxan Yildirim

**Sererastkirin**
Eslîxan Yildirim

**Berg û Rûpelsazî**
Dawûd Rêbiwar

**Çapa Yekemîn**
Weşanên Azad, 2022

**Çapxane**
Bizim Büro Matbaa Dağıtım Basım Yayımcılık
San. Tic. Ltd. Şti. Sanayi 1. Cad. Sedef Sok. No: 6/1
İskitler / Ankara
**Sertifika No:** 42488

**ISBN:** 978-605-81463-9-6

**Navnîşan**
AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah.34330 Sk. No15 A/4
Mezitli/ Mersin
**Sertifika No:** 40407

**WEB:** www.wesanxaneyaazad.com
© ***Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.***

**MAHSÛM DÎMA**

# Dema çav ji evînê dûr ketin

AZAD

MEHSÛM DÎMA

Di 1ê Avrêla 1993yan de li Nisêbînê hatiye dinyayê. 8 sala li navçeya Kertwênê ya bi ser Nisêbînê ve dibistan xwendiye. Di 2009an de ji ber sedemên siyasî hat girtin û 38 sal ceza lê hat birîn. Li girtîgehên wek Maltepe, Metrîs T1 û 2, Tekîrdag F-2 û li Kandirayê ma. Hîna jî girtî ye li girtîgeha Bandirmayê dimîne. Ji gelek xebatên wî yên helbest û romanan, ev xebata wî ya çaremîn e ku tê çapkirin. Pirtûkên wî yê berê hatine weşandin ev in:

- *Şev Tazî Bû Di Awirên Te De* (çîrok)
- *Sedsalek Bi Îskeîsk* (helbest)
- *Pîroz Be Vegera Li Xwe Dilêra Min* (çîrok)

NAVEROK


Dîwana Evînê ........ 7
'Emrekî Westiyayî ........ 8
Lewhayan Te Nîşan Dida ........ 9
Kêliyên Ezxwar ........ 12
Baskên Bixwîn ........ 13
Awir Termekî Terikandî ........ 14
Rîtmek Bêaheng ........ 15
Kîtekîtên Tirsnak ........ 16
Torenek Bêqural ........ 17
Çîrokeke Bêqedan ........ 21
Wargeha Min ........ 29
Çav Bişikê ........ 30
Min Zimanek Nedît ........ 32
Bênavber ........ 33
Min Tizbiyê Xwe jî Qetand ........ 34
Min Dît ........ 35
Bêpirs ........ 37
Em Bê Xof ........ 39
Çalekî ........ 41
Rencûrek Jî Ez ........ 42

Siya Hestan ........................................................ 43
Tehma Xewnekê ........................................................ 44
Çend Caran ........................................................ 46
Tengijîm ........................................................ 48
Gotin Riziyan ........................................................ 49
Gola Êşan ........................................................ 50
Kêlî û Sal ........................................................ 51
Hezkirinekê Tijî ........................................................ 52
Dilekî Şewitî ........................................................ 53
Tenê ........................................................ 54
Sê Pereng ........................................................ 55
Şûrê Bêkalan ........................................................ 56
Ji Ber Vê ........................................................ 57
Gêjgerînk ........................................................ 68
Gotinên Mitrî ........................................................ 72

## DÎWANA EVÎNÊ

gotinên li ser zimanê min şikestin
qelîştokek ji xweziyên jenggirtî
di bêbinîtiya vê valahiyê de
roniyek
kurmekî mejiyê min dikola

û janên ku
li ser awiran nepixîn
bêzariyek ji hestxapandinê
de êdî vî laşî
raxin dîwana evînê
da ku mirin
tu car neyê serlêdana min û te

## ‘EMREKÎ WESTIYAYÎ

li pişt her xewna biefsûn
xewnereşkeke fetisok
westîna salên ku
bi ser emrê min de tewiyan
çareyek ji derhozeyan
bêşemal, tu mîrwariyan
riyên ku di hişê min de winda bûn
negotin
qêrîn li tayên porê te ketin
û ez niha
li ser keleha bajarekî hilweşiyayî
dilê xwe dikeritînim
ji nebûna te

# LEWHAYAN TE NÎŞAN DIDA

roniya ez ji rê derxistim
sêhrek li ser bayê şevê nivîsandî
û çend gotinên lal
di gewriya min de asê

awirên ku min vedixwand tunebûnê
di berza evînê de kemînek ezxwar
agir min dahf dide laşê te
û ez tî bûm niha
rêwî bûm
hewce bûm
ji bo hestên te

pêlên ku bîranînên me miz didan
demsalan rihê min dikeritand
di taldeya kuçeyên perjeng de

xewnên li ber zerbûnê
matbûna hemû rengên şoxîn
tarîtiya demê çizirîbû
hinavê ezmana bêrehm
ez li bin siya ewrekê li te digeriyam
bêşop
deng wek qêrîneke bêdeng
diherifîn li ser sînga min

û tu wahayek jêveneger
stêrkek bi çirîsk
vegere dilê
li kavila pişt xwe binêre

sînorên xeyalan nebû
di hatina ber bi te ve
riyên fetlonek
dîmenên xirîner
rih perpitî
di gêjgerînka dilê te de

şevek ji şeva din bi jantir
hejkek bêqedan
nalînên dilşewat
dil bi bijangên te ve hatibû sêdarê

keziyên te wek gulên bêhnê
sêhr dikin vê gerdûnê, dagir dikin
dagir bike
bimête eyy ar evînê
vî dilê ku
ji kaniya rihê te av vedixwar

## KÊLIYÊN EZXWAR

kêliyên ku xwe li valahiyê pêçan
bêzariyek kûr û ji binî ve
dilê min niha ji bo te keser dihonan
di gerdûna xwe ya talankirî de
ji eksa jibîrkirinan

remzên têkçûyîna di evînê de
janên bêpênase
bendewariyan xwe negihand hêlîna hêviyê

cîhanek ji pêşrewan
ketin û derketin
mîna lavlavkê bilind bû li can

şevê hestên min daqurtand
li ber devê deriyekî kevnar ê şikestî
tewiya me bi ser xwe de
û ji dûr bi çavên te
li asoya nava xwe dinêrim

# BASKÊN BIXWÎN

dexezeriya demsalên ku
eztiya min çilmisandin
rîpên mêzixandinê
rûyên bi talde
çivîkek ji hêlîna xwe ketibû

vemirînin hemû roniyên zenûn!

tenêtiya li ser baskên min bi xwîn bû
qêrînek ji bîra ezman
û ez bêsewt
wek dîwarekî
hêstirên xwe
bi ser tunebûna min de birijîne
ji hejkên ketinê dûr delalê…

## AWIR TERMEKÎ TERIKANDÎ

heyva ku dewsên xwe danî ser şevê
di awiran de bêhna termekî terikandî
şewşiya bayê li ber çûyînê
raza ji hebûna xwe bêzar
erdek hebû ji erdan bêdemsal
gotinan xwe pal daye mirinê îşev

giyanên ku ketin bîra xwe
di behreke bê av de keştiyek
kulîlka dawî jî diçilmisî bêdeng
bê ku bizanim
bê aso dimeşim ez
bi lehiya nava xwe re

# RÎTMEK BÊAHENG

di tariyeke sar de
xewnereşkên ku xuricîn ser xewnên min
di siya bêdawiyê de rîtmek bêaheng
guhê min li ser newaya bayê rojava
û bişirîna keçikek dêmdur, şermîsar
bi hemû bêgunehiya xwe
diçizirî belengaziya giyanê min

bi her zeraqê re
aliyekî min şikestî, bêparastin
çav çelak davêtin keziyên te
û ewr mîna teyrekî rewende
xwe li dûrahiyê didan
ezman dirije ser valahiya xwe
tu di kîjan rondikê de winda bûyî
dilevîna min

## KÎTEKÎTÊN TIRSNAK

mîna çîrokeke şapînozk bû dem
dema ku te ji nav bîranên dûr dixist
kîtekîtên tirsnak
miriyê ji nav xeyalan radibû
di her çûyînê de
bêdengiyek canzer
çav ji giriyan re avis

û dîsa talan dikir peyvan dilê min
di her peyvê de tu
wisa şox û lenceyî
xwe li hizrê min dineqişand sîtava wan
û her kebarê min
bi rengên wan tehfîl dikir hêviyên xwe
bê te

# TORENEK BÊQURAL

çavên ku
giyanekî kujer li xwe pêçabû
bêaramiya xewnan
bendên xwe şikandin
hemû gotinên dîlgirtî

torenek bû, bi xwîn
bêqural
û siyên ku bi ba re dihejiyan
serberjêrkirina ji bo şewqekê
perestgeha dilê min tu
vêxe agirê şerekî bêaman
geş bike
har bike
bi serê tiliyên xwe yên kubar

bijangên ku min li çarmixê dan
di hikma demê de nediyariyek
birûsk di hinavê min de diteqin
ewrên evînê
xwe li ezmana çavan kom kirin

rûxînên vî giyanê birîndar
jakawiya jînê
kaniyên ku êş diverişîn
bêsekin diherikîn çemê vî dilî
û ez di deryaya te de fetisandî
bêçare
bêrîkirin diniqutîn ser dilê min

xewa ku ji ser çavan hilpekî
di riyeke fêlbaz de awirên te
ezman xwe li sewdaseriya şevê dabû
hilma min
mîna ewreke bêcelew
li ser govekên te

de bixuricîne hestên westiyayî
(ewên ku te wêneyê wan çêkir)
bi ser leylanoka dil de
çilêziya xweziyên hinavê min har dikirin
leyana keseran
marên di quncikan de veşartî
bi gotinên min vedan
û destê min
li porê te digeriya
hew dalanak bû min nedidît lê
diketim xwar

me li hev kiribû
di bêdengiya me de, bi serberz
dê ji xwe biçûna hemû deng îşev
dil dê perdên xwe biqetanda
li ser baskê balindeyê birîndar
û pîjbûna hest ji xeyalan re
belkî xaçepirsek nediyar bû
belkî bayekî bi raz
dê xwe bigihanda rawestgeha vê evînê
me ji ku dest pê kiribû
em li ku li hev hatibûn
tev xeteke xwêl
ez ê dûr bikevim niha
ji geremola nava xwe
wekî heyva ku
diterikand ezmana xwe ya gunehbar

# ÇÎROKEKE BÊQEDAN

dil diqermiçîn
dema ku çav ji evînê dûr diketin
şîfreyên li ser peyvan nivîsandî
bêkelecaniya dengên hundirîn
sar bûbûn hemû rengên ku diçûn jiyanê
di keseran de kovaniyek zirav
guregura ewrên li ezman
hestek bêçêj bû şadî
wexta te terikand xewnên min
kevz girtine niha hemû xeyal
tu tişt ji baxiya demsalan nema
parîxur in roj, ne dilovan
kêlî bûne çerxek ezxwar
de biherifîne êdî
bermahiyên dawî yên dil
belkî bibe tovek ev giyan
li erdnîgariya laşê te

wek remzeke pîroz
awirên te neqişîn li ser hestên min
hiş di gerava evîna te de
stêrka sarî
û heyva ku bi delaliya te serxweş dibe
îşev
dê bixayîsin tevahî şemalên bajar
bi te re
lê bê te

bijangên ku hinavê min rûxand
çav hêlîneke biefsûn
û li ser dil direqisî agirek
ev, agirê te bû
biherifîne pirên dûrketinê dilê
bi xweziyekê
û were bibe xwedawenda van hestan

jeng girtibû hemû bedewiyan
wexta ku demê
sêhra çavên te winda kir

afirînera hêviyê tu
geş bike xeyalên bi evîn
li ser aliyê min ê birîndar

demsaleke bi sûket
dilê ku bi bêrîkirina te ve hilkişî
ji ewrên hinavê min dibarîn
peyvên min ên bê te

wek çîrokeke bêqedan
hedan bi gavên min nediketin
her dema ku
ez dihatim evîngeha te

li berpalên evîna te
ez ê hestên xwe bişom ji tenêtiyê
çavên te dê bibin stêrkên min
û dê hemû pirtûkên pîroz
bi navê te dest pê bikin

di şevên tarî de
roniya min tu
ez bêmecal
wekî helbesteke kal
bi destên xwe bipêçe giyana min

dilê min
bi qewleke xwedayî bang dike
bi hemû şeydatiya xwe
ez ê
ezmana şîn li bin lingê te raxim
bes ku tu
porê xwe li ba bike ji min re

erda ku bi bişirînên te nepixiye
li ser sînga min
bûne kulîlkên evînê çavên te
ez niha hêstiran didoşim
ji tunebûna te
dûr nekeve ji bin ezmana min dilê…

ewra ku li ezman diricifî
agirek di dilê min de bêhempa
keseran xwe li galegotên şevê xistin îşev
û çirîskên ji qeraxên çavên te pekiyan
ez bi bêhna evînekê sergêj bûme

newayek di bêdengiyê de bêpêl
giyanek bû laşê min dileyand
awir wek rimekî dexezar
min di çîrokeke li ser zimanan de veşêre
kêliyên ku min dagir dikir gerdûna te

bendewarî dibû êşek
ji bo çavên li hatina te
û diçilmisîn kulîlkên bihara min
demsalan,
hêviyên min dixwar bêxem
dojehek di nava min de disincirî
ji nebûna te
yê ku dimir ez bûm li kolanan

diteyisî stêrka gelawêj
di şeveke reş î rûsar de
bajar xwe tewandibû ser
sewdaseriya hestên min

çavên min li şopên çûyîna te
laş perçebûyî, li holê
didirî salan hemû gotinên evrar

wek razeke nîgaşî tu
di çaleberfekê de qîjek
xumexumek li ezman
deng li kûrahiya nava min diketin

li te dipirsin niha kulîlkên bêax
axa bêhedan
û ez ji tenêtiyê bêzar
bihewe êdî revokê
li kuçeyeke dilê min

xemên ku dilê min şêlandin
bêgunehiya heyvê
evînek birçî xwe gevizandibû
li ser gotinan
û li bendêmayîn tîreke bêdeng
diqelişîne canê min ê bêmecal

demsalên ku hêviyên min xapandin
salnameyan
ez dîl girtim li pişta deriyekî kevzgirtî
kêlî niha hestiyên laşê min dikojin
piştî tu çûyî
nivîna mirina min danî teysokan
janeke tehl û nehewok
riya hatina te bi min da jibîrkirin
lewma dilikumîn stêrk
li ezmana serxweş
digiriya baran
û gazî te dikir hêsirekî
bi hinavekî bûyî wek volqan

çavên ku çîrok dabelandin
di dalanên giyanê têlmaş de, bêaramiyek
gotin li lûtkeya awirên te felişîn
newal bêdeng bûn niha

û sîsarkên ku derketibûn lavaya xwînê
ji dûr
dengê kerasetekê li ber guhê min
ez dizanim tu yê
çirûskekê bavêje nav şeraba min a sor
fermo min agirê şerê dilê xwe vêxistiye

siyên ku li pey rêçên te ketin
rawestgeha dawî dilê te
ar xalî ne ji temenê min
parçeyekî dil tu, birîndar
textê xwe deyne ser
êşên min ên lal û bêzar
şerê me dê li vir dest pê bike
bi helepel
û bi ramûsanên kelecan

# WARGEHA MIN

heyva ku bi ser hestên min de gindirî
dil di kovaniya xwe de bêdeng
awirên te wek dojehekê, şewatok
û ez dicemidim
li ber bayê xeyalên penaber
ên ku tim qala dikirin

bextê min di gewriya hûtekî de
hiş bûbû hewirzeya nediyariyan
ez ê vê berbangê te nebînim
biqeşite eyy xweda
ji wargeha min
pelîdek bû niha
bi xatirxwestinên min re hevşa dibû

# ÇAV BIŞIKÊ

reşahiyên ku ji kolanan vekişiyan
wekî volqaneke bêsebir, dem
baran barî ser hêrseke tepisandî
pêlek di deryayê de dilerizî
keştî di xayîsiya qulibînê de
şikek li ser tariya şevê
aşîtek herikîbû ser valahiya dilan

û ez li benda gotineke evrar
di xumîna hestan de ahênek
kêliyan diranê xwe di laşê min de kir
demsal rêbirekî bêrehm

çav bişikê
bila tav bi ser bîranînan de bikeve
û dax bike evînekê li ser vî dilî
mîna çarenûsekê,
soz ezê jê nerevim
çendî ku war nemînin jî
ji hebûna me re…

erdheja ku eztiya min hilweşand
di çavên xwedayekî de fêlbaziyek
şûrê xwe, li min dikişandin bijangên te
netirse delal ez tim ê te bûm

çavên te kemîn danîbûn
li ser riya min
hestên te bûbûn nêçîrvanek
û derketibûn zevtkirina dilê min
ez ê ji te re raxim vî dilî dilê
li çokên bayê rojhilat
li ber newayên keserbar
bes tu aj bike xeyalan
di roniya kebarên xwe de
her roj bêtebat
wek lavlavka ku dirêjî ezmanan dibe
û ez ê çirîskên te kom bikim
ji nava tariya şevê
dê li xwe werqilin stêrk, bi tirsekê
heyva zenûn
çûkên bêfitrak
dê li te vegerin hemû evîn
bi qêrîneke bêpeyv

## MIN ZIMANEK NEDÎT

asoya ku giyanê min disiqiland
di malzaroka tenêtiyê de hest bêdeng
gav dilbitirs
û gotin westiyayî

roj bi jakawiya demê rakişîbûn
ser qêrînên lêvên te
laş kêlî diçirandin
wek bêpaxiya zarokeke nehsok
îskeîskek ji bin ewran
bêxwîn
zêmarek li keviya dilê min gelicî
delaliya ku di rêzikên dîrokê de winda bûn
kenê te pîrozweriya xwedawendekê
çend jan bûn diqelaştin
çîroka min a nîvkuştî
hêj min zimanek nedît
ji îbadeta evîna te
xak heyfa xwe bi xwe tîne
çiya şîna me digirin
û ez di deryayek bêkeştî de
li pêşrewên xwe siwar bûbûm

# BÊNAVBER

vê berbangê
ez ê rondikên te hildim hembêza xwe
û bimeşim nav xumama payîza bi sûket
ahênên bêdeng
fîganên bêhêvî
kuçe dê li xemgîniya dilê min biterpilin

razên ku xwe avêtin paxil tariyê
bêhna keziyên porê te
dilê min dişand ber giyotînê
hîna baran bi ser hesreta min de neketibû
ji ber ku
gotin bêwar mabûn
li ser vê axa bêziman
hêvî bi xewnereşkan re direqisîn
axîn difûriyan ji ser nexşeyeke hêşefk
bayekî sar, kujende
diqerisim li ber xewnên xwe
pif bike agirê hinavê min
bênavber
bi hemû ayetên bêcelew

## MIN TIZBIYÊ XWE JÎ QETAND

xofa ku xwe li gotinan pêça
di nalînên canzer de nîşaneyek
gunehkariya ku tevna xwe rist ser bajar
ez di tehma şeveke bêkebar de dîlgirtî
li kûmîna aşopên bişengî
bitirbûna hestên nojek
dereng ketin kêliyên min ên mirinê
awirekî tûj
di bin ezmaneke sor î kujer de
fermana înfaza xewnên min dabû
maran xwe vekişandibû quncikan
ba ji zinarekî hişktir
ji bêrîkirina te
min tizbiyê destê xwe jî qetand
de îcar birûxîne
bîranînên ku gavekê li paş man

# MIN DÎT

min dît
pêlên ku xwîna min kel dikin
di nav xweliya şewatekê de ez
bi janeke cimbûz, rûsar
ji xatirxwestinên te
diparzûnînim zêmarên xwe
dixûricin ser sînga min
hemû kovaniyên vê helbestê
difetisim di gerava xwe de
ji aciziyê stêrkên li asîman dihejmêrim
an jî tayên porê te tînim bîra xwe
û ditewim bi ser kêliyên xwe de
min ê bigota
bi çend remzên kurdayetî
bila bineqişînin ser bijangên te evînekê
û bila bigirijin êdî behrên kujende
li ber hêviyên te
bi ekseke windanekirina xeyalên rihanî
tu yê bimeşî
ez ê jî bêhn bikim şopa gavên te

dê carekê li deriyê dilê min bide
azadiya li giyanê te veşartî
ez ê sermest bibim, lê
dê zimanê min negere ku ez bêjim

wekî razeke pîroz
dê di nava destê min de bimîne ew kêlî

û dema bahorên behran
behsa sêhra te kir
vegere li hinavê xwe binêre
tu yê bibîne
hesreta vî dilî
a ku ji bo te herifî
bêxap û bêrîp
bi tiptazî li ber te

## BÊPIRS

di nîvşeveke xayîs de
bişirîna perperîka birîndar
xaleke gunehkar û bitenî
li ser rûçikên demsalê
zindanek di hundirê vê helbestê de
dîlgirtiya wê tenê tu
bi hêrsa ji rojên borî
dirizîne dem hemû dûrketinan

û xalî dibin stêrk ji ezmana xwe
diricife berf
dicemide tav
bi mitrîtiyek baxî
heyv dikeve nav bexçeyê dilê min
û bêpirs dibezim ber bi asoyan
şewqek çavên min diçûrisîne
mirinek hişê min dikeritîne
bi dîmenek pançilî
dileyîne vî dilî tu
bi bêdudiliyeke viyanî

ewrên ku bi êşan nepixîn
baran hedana şevên min î kor
di çarenûsek windayî de dialiyan
destanên giyanên bênav
bi zimanekî bêpeyv
demê rehma xwe vekiribû
ji şapînozkên bêjî re
sewdaseriya welat
di guhê min de olan dida
tehmeke bitirs li ser kuçeyên bêdeng
ez di seyra çirîskên çavên te de
hebûna te dergûşa bedewiyê
şeng dike pelên bihara min
dibijin kulîlkên rengîn
bi keskesora ku dibû pira dîtina te
û agiran hil dike
ji xweziyên bêpar mayî
gêj dibim li dora gerestêrka te
destê min bigire

# EM BÊ XOF

cêrên lanetiyê dê bişikin
bi rimên dîroka berbelav
kuştiyên bêkefen
şevên bêronî
tilîliyên kerasetekê dê birijin
ji ser lêvên terikî
û awirên ku dê bibin
haveynê qewla fermanekê
pirsek bêsebir
dê bijenîne tunebûna perşikestî
li ser lîsa dilekî serhildêr

sedsalek
dê di hundirê xwe de bisincire
û em ê pif bikin
serpêhatiyên ketin û rabûnê
çiya dê bihejin, em bêxof
melisîne lûleyên ku
berê xwe dane eniya me

ji gotineke xav dipekiya
tîreke zengarî
lavlavkên çîroka dawî
hêrseke tepisandî radiza
li bin birûskên gihiştiyayî
û xwîna ku di rayan de dikeliya
şewateke tûj, rajor
xwe li dehma hestên nojek dida
xalek perçebûyî, bêxwedî
bêzar in dil ji qefesa xwe
diviya biqediya bêdengiya westiyayî
halê şewşî
û mejiyê di geranekan de fetisandî

kifşek
ji înkarê ber bi hebûnê
bi êşa zimanekî birîndar
radipêçe giyan
ew serhildêriya ku te
bi destên xwe tevna wê ristiye

# ÇALEKÎ

hişê ku
di bêwateyetiyê de dikulê
rastiyên çeloxwarî
terikandin sehekiyan
xwe ji geraviya hebûna xwe
xalên bi tirûş ên jibîrkirînê
gotin
findek vêdikeve di nîvê şevê de
rûxiyan qalibên şêl û ramînê
bînin vir wê hêviyê
bi perestiyekê,
ewa ku sawîna me bi şid
li nav rûyê me dida

razbera ku heyîna xwe pêk neanî
kêli ji dema xwe qut bûbûn
û di sêhra temaşeya gerdûnê de
xofek
şopên xeyalên qedexe
deyne aliyekî xwestekan
çalekî perperîka azadiyê
çarenûsek divê bê nivîsandin
bi helkehelk
di nava şerekî bêaman de
û qefesa dîlgirtina hestan
em ê nelîzin vê lîstoka
"heme-tune me"

## RENCÛREK JÎ EZ

bi giyanekî nîvî
evîndarekê ku li evîna xwe digeriya
di tenêtiyê de çavekî şermok
wezîna bayê bakurî
her çûyînên bêdem
bi bendemayîn xembar ve dizeliqin

û rencûrên perpitînê ez
peyvên şil daketibûn ser rûpelan
pênûsa min bi tenê
xweliya canê min
ji hestên fûriyayî
penaberiyek li stêrka berqok
îşev
xwe li dilê min bike mêvan
bi tîbûna kesereke bêsînor
hîna ku xumam daneketiye
ser perestgeha evînê

# SIYA HESTAN

kevaneka ku jiyan daqurtand
di tûrikê derwêşekî de gotinek
hêviyek dipijiqî ser wateyê
çavên te dîl ketibûn destê vê helbestê

û dilerizîn hemû dengên xizxizok
li ber êşên harbûyî
pînîtiya dan jibîrkirinê
lanetiya demê
rê vebûbû êdî
ji dilminiyên bêşerm re
lê ez ê,
lê ez ê bikavilim li ser dêmên te
govekên te dê bibin gor
ji stêrka gelawêj re,
û ez ê pişta xwe bidim
siya hestên te,
bi kilamên dildarî
dê ji nû ve bê gotin
gotina dawî ya di tûrikê Derwêş de
“hezkirin”

## TEHMA XEWNEKÊ

dilê di geraneka kovaniyê de lê dida
sûketa giyanê şikestî
îşev heyva li çardehê
direviya ji ber xewnên min
mîna her carê
ez ê dîsa te bi bîr bînim
li bilindahiya Çiyayên Çîrokîn

ewrên bêrêgeh
ezmana bêdeng
û di tenêtiya min de tu
wekî stargehekê bûn çavên te
ji elemên dexezar re

perengên ku bi ser hestan de ketin
hîskirina evîna bi şewat
dê fêr bibin kêliyên bêdem
ji paxila dîroka ʿeksok

û bayên ku
bêhna rêçên te birin
siya te digobilî di laşê min de
hê nû li xwe werdiqilîn aso
her gavek
min dianî ji çavên te re
bêpirs
bêtebat
bi şeydatiyeke misêwa
bi tehma xewneke xemrîn

# ÇEND CARAN

axîneke kûr
di rondikên çavên xumarî de
şeydatiya evîna ku
xwe li çola pêşrewan dida
çilêz bû goristan ji evînan re
hest bîranînên xwe dimijtin
li kuçeyên xil û xalî
tevizînokên laşê hejar
didewisand dem
rûdenguliya sîtava bêqedan
cemeda li ser rûyê tavê
riyên bi fetlonek
diteriqin morîstank ji hêlîna xwe
û ez li rawestgeha dawîn
bi gotina ewil diqêriyam
te çend caran
ev dil bi xwe re biribû dilê
çend caran…

wisa rakêş
wisa ji dil
wêneyekî te mabû, qetiyayî
bi dîwarê ku
bi bombeyan hatibû herifandin
lê dîsa jî
kenê li ser lêvên te sar nebûbû
bi ekseke jibîrnebûnê

# TENGIJÎM

bablîsoka ku li mejiyê min qelibî
tengijîm ji hestên sar î mikûsok
rengekî mat û nediyar
bajar min kovî dikin di hembêza xwe de

û tenêtiya ku eztiya min dizî
min riyek nedît ku ez li xwe vegerim
gelemşeya li hinav
qedexeya li ser ziman
dipişkin ser asoya min ewrên dexezar
dûr dikevim ji tixûbên çavên te
rawestan wekî çaleke bêbinî
ditevizîne laşê min dengekî berberok
lê
lê dîsa zengila bêriyan lê dida
û rondik mîna moriyan dikevin pey hev
diguvêşin vî dilî wêneyê kenên te
nepirse çend caran min kuştibû
wan awirên dilbijok
ewên di tenêtiyê de sitargeh
di şevên reştarî de heyva min

## GOTIN RIZIYAN

di aşê nebûnê de hêrandin kelecanên me
pûçbûna demê
û derdên ku xwe li peravên hestên me dan
dikojim niha hemû nîşaneyên evîna bêhewa
sûketiya heyvê
toqîna ezman
lewhayan berê min didin kendalan
û qêrînên ku li ser erda dilê min herifîn
jiyan guneheke bêlorîn
di hêlîna giyanên şewatok de
axînan xeyal dorpêç dikir, bêpaxav
gotin riziyabûn
li destpêka helbesta dawî
dê neyê nivîsandin hew ev çîrok
li ser rûyê rûpelê spî
wexta ji bîr bûm di dilê te

# GOLA ÊŞAN

li ber ava çemekî ketibû
aşopên dilbir
sirwezek di kolana dil de
kêra xwe kişandibû mirazê bê ziman
ezman li tenêtiya min har bûbû
bê daraz
hêvî diniqilandin sîsarkên birçî
li bazareke terkkirî
kurtepistek li tariyê
xewnan raz dimêtin
di xamoşên bêrih de
ez bi serdestiya çavên te mest bûbûm
de êdî bila were
ew mirina bizdonek
bi barana rejneyî re
li çoleke bi êşan dagirtî

# KÊLÎ Û SAL

bîranînên ku li ser rûyê demsalekê rûniştin
çîrokan keziyên xwe honandin
li ber siya giyanekî stûxwar
peyv bi xayîs
pênûs serxweş
dil xwe pal dabû efsûna şevê
tenê çavên te dibiriqîn
di xweziyên dema qeliştek de
dilerizîn bajar ji tunebûna te
şîn digirt şalûlan, bifîgan
kêlî pif dikir salan
û li ber bayên sar diketin
pelên salnameyên efnikî
ez di hejkeke bêsekin de
wek çarenûsek bed li ser eniyê nivîsandî
dilminî difûre ji ser sînga min
lê dilê bi evîn
xwe berdide geliyê evîngeha te
bipêçe bi awirên xwe yê zar
hembêz bike
bi hilma agirekî dojehî

## HEZKIRINEKÊ TIJÎ

stêrkên ku di deryayê de diçûrisîn
hinavê min ji hezkirinekê tijî
şevê raza xwe dicût
li ber awirên te yê şermîsar
îşev ez ê kerba xwe pîj bikim
ji hêsirên te re

peyveke rewan
laşê ku bangî giyanê xwe dike
bi helkehelka bazgerekî bêhêvî
dilerizim di hesteke bi axîn de
sirwezek bêdeng eniya min miz dida

di çûyînan de dişikestin
rêzikên ku diketin ji pênûsa jar
hibra wê ji xwîna dilê min
tenê mabûn xewnên rengîn
yên ku li te digeriyan
di şiverêyên pêçok de

# DILEKÎ ŞEWITÎ

birûskên sor û har
ên ku li ser bihara me teqiyan
tofanek di cenga dilan de
xwe ji kolanan vekişandibûn
hemû siyên heşêfk
û mijê dest danîbû ser bajar

di kûrahiya tariyê de
dengekî berberok, rûsar
diçilmisîn stêrkên berqok ên ku
ji bêxemiya ezman bêzar

dilê min niha
bi hevokên şewitî tijî
wek derdgiraniya min
evîn nebû teyrekî azad
li vî warî

## TENÊ

lembe temirî ne
reş girêdaye demê
wext hatiye dizanim
min barê xwe hildaye û ez diçim
tenê
ji bo ku
ji bîr nebe
dibêjim
dilê xwe dihêlim ji te re
di helbestekê de
di sitranekê de
her ku te xwend
stêrkekê bigire hembêza xwe
piştre
bide pey rondikên çavên şevê
vegera wê tune ye
cixizî jî nabe
ne lîstokeke ku hatibû sêwirandin
ne metelokeke li ser zimanan
ev bû çarenûsa min a derewîn
ewa ku li tu derê hêlînek nedît

# SÊ PERENG

şevên ku ji westîna xwe diqêriyan
wahayek tu
ji bo kedera dilê min
û parçebûna heyva xewnan
birînek li devê jîna çîrokîn
giyanê me agir dialêst
li xamoşan
dema ku her sê pereng
diketin av, ax û hewayê

êşên ku ji ber teqîna bombebaranan mayî
pistepista miriyan di guhê min de
diya min li çokên xwe dida dîsa
por dirûçikand li kolana tazî
rojeke biharê bû
hê nû berf rabûbû ji erdê

## ŞÛRÊ BÊKALAN

zimanê me yê ku hatibû daxkirin
pincirandin hestên serhildêr
ji ser rûpelên dîroka windayî
ev şerek bû
taa ji destpêka şaristaniyê
wek şûrê bêkalan
bêsebir dil
Dîjle zêmara heft hezar salan dixwîne
û tixûbên ava bûn li ser nexşeyan
bayê reş, sar û tevizînok
bêhilmmayîna balindeyên bêsitar
wê derbas bibin
wê derbas bibin
tariyên ku hikma xwe dianîn ser rojên me
belkî bi gotinekê
belkî bi tilîliyên dayikeke hêvîdar

# JI BER VÊ

siya ku ket ser behrê
keştiyên li dilopan qelibîn
û ev fermana dawî ya xwedê
devê xencera min bixwîn, dimeşim
di devê min de
tehma çîroka bikovan a xwekuştinê
rê winda bûn li asoyan

tu hestê fêm nekir
birîna li dil veşartî
ji ber vê xeyîdîbûn peyv
kujende bûn awir
ji ber vê kelogirî bûn baran
ji tenêtiya heyva min re

berbanga ku bi mijê nixumî
nîşaneyên nepen li ser riyên çolê
tenêtiyan
li bêdengiya heyvê dinihêrî
û demsalek
di hinavê min de dimir bêpeyv

wîzîniyên ji asoyên dûr dihatin
tu tişt nehatibû dîtin ji çîroka me
di nav xweliya dîroka nivîsandî de
nalîna hestên bêkefen
xemên ku dileyandin dil
xwe bi werîsê evînekê vekiribûn
hêviyên ku li benda te diman

demjimêrên ku bi rojan ve aliqîn
lerzok
şewqa awirên te li ser kevirekî sor
diherifîn bajarên li hebûna te giran
qêrînan jan diparzûnî
û te porê xwe li ba dikir
li çiyayê dilê min, li aliyê rût
ji newaya demê re

û agir bûbû verişîna gotinên canzer
kêliyek ji telaşên pêşerojê
di kemînê de
çok danîbûn guleyan, neçar
li ber çirîskên bedew ên giyanê te
lê tu
hê jî ne xuya bûyî delala min

jiyînên ku trajediyên xwe honan
wek lavlavkekê
xeyalan diranên çerxa xwe rizandin
li ber keleheke dagirkirî
pinîtiya tajanên bêdeng
dîrokek bi xwîn
li ser neqşên rûyê te
û belavbûna tariya kujende
rêwiyên bêpûsûla
riyên nediyar
çûkên bêqeyd ji emana xwe kerixîn
tu dîlgirtî
di rêzikên helbesta min de

rihê ku ji laşê xwe
hatibû koçrevkirin
di dergûşa pîroziyan de dildariyek
şûrê li destan, xinis
û awir wekî razeke westiyayî
peyvên ku bi ser xwe de tewiyan
bêgazin
baraneke bêqedan bû dibariya ser
hêla min a ji bo te şikestî
û şîndoliya sîtava keskesora rengîn
diltirsiyek li demsalan
mîna aşîtekê diherikîn ser kêliyan dem
tenê çavên te
ez vedixwendim wateyekê
ya ku ji min û te pê ve kesî pê nedizanî
di evînekê de

veqetînên ku hatibûn sêwirandin
şevên şewitî
çav li xew
li warê hezkirina me ketibû
hemû hestên me yên bişengî
çi dikim ji bîr nakim
efsûna wan çavên dilbijok
dilê wek helbestê
û bijangên ji guleyan kujertir

şîfreyên laşên te li ser giyan
remzên xewnan ramanên min dikeritînin
ez ê îşev
vê şeva payîzê
ji bo xatirê evîna nîgaşî
biterikînim erdnîgariya dilê xwe
ji dilê te re
li gel zivêriya ji çûyînên janbar

şeva xwe ji heyvê re raxist
bêdaraz qeydên ku li lingan ketin
ji dûr mîrwayek guhê min dinapirand
û bayan bajarên mirî digobilandin

tenêtiya hinavê min diqewart
radestî bêdengiyê bûbûn
qêrînên bêdilminî
berfa ji zivistana çûyî
(ewa sar, tevizînok)
dibariya ser helbesta nava min
û dil ji bîranînan dagirtî bêzar
bîskekê çavên xwe deyn bide min
ji bo tif bikim lanetiya serdema xwe
bi çend peyvên bêjî

roniya sibêya ku çilmisî
newaya kilama te bêdeng
şopa gavên te li kuçeyan
zimanê ji nebûna te lal
bedewiya te xuriciye ser sînga min
bêhedan
hildikişim bîranînên winda, yên şêlandî
yek bi yek parçeyên eîdî te radimûsim

û hesreta ku
min di hêviyên xwe de defin kir
kêliyek ji kêliyan
xwezka min serê xwe
deynaba ser sînga evîna te
tu hestê
dê venegotiba vê cihana min a talankirî
tu gotinê
dê danegirtiba taldeya hinavê min
bes ji xencî sêhra wan çavan
û şevên ku te tînin bîra min
dê tu tişt dilminî nekiriba vî dilî

pêşeroja ku di hişê min de digeriya
xaçepirseke nediyar
xewnên bêgor
û şevên dirêj ên ku nehatin ziman
dîwana xwe ji janan re vekiribû
dilê min ê bi hebûna te dikeliya

mija ket ser veqetînan
bajarên sewdaserî
hestên serxweş
û bêjeyên xwe li kovaniya min dipêçan
bêsebir im

(de bêje
de ka bêje delalê
ev teqînên di hinavê tavê de
teqînên hestên kîjan evînê bûn
û yên kîjan evîndarî)

remzên giyan didirandin
çend peyvên lerzok
li ser zimanê min
dil xwe li razehêza asoyê alandibû
qemçiyê demê
şopên ku te dianîn bîra min
ez dîlgirtî bûm niha
bi hemû torên awirên te

çiyayên ji tenêtiya xwe herifîn
demsaleke hênijok
rûyekî birûpoşî-levok
xwîna razekê di rayê min de
ez ê bigirim paxila xwe îşev
stêrka xwe ya berqok
ewa ku tu car naşibiya kesekê
li ber guleke biherzing
û qêrînên çûriska ji agir pekiyayî

dema ez çêbûm
diya min got
Xwedê li ber guhê min qîr kiriye
gotiye;
“Eyy evdê min ê di pêşerojê de
bibe dilbijan!
ez erdeke destpênebûyî waadî te dikim.”
Pitik bûm
min fêm nekir
bûm zarok
mereq nekir
piştre mezin bûm û
bûme xortek
ez hîn bûm Xwedê
behsa dilê te kiriye
û îcar ez niha diqîrim
“Tu li ku yî eyy mafrevokê
ez erda xwe ya waadkirî dixwazim”

# GÊJGERÎNK

ji behskirina bedewiya te
gotin li ser lêvên min heliyan
min hebandinî kenê te kir
awirên te perestiya dil
û tu dîsa ne li cem min

çend birînbûn laşê min diguvaştin
wekî di behreke nepen de bifetisim
roj şewatok bûn, bêhîs
jiyan ji dara min a bêtaqet weşiya
pê re gelek tiştên biefsûn
di nîvê vê çîrokê de giriyan
bîranînên me
çûyînan kovaniya xwe danî hêlekê
jibîrkirin kujerekî kor bû
tu yê fêm bike
bêhna xwîna ku ji bayê şevê dihat
kêra zengarî
û xeyda heyva zenûn

ev kesera evînekê bû li ser min
westiyam ji dilmîniyên bêdemsal
ewr bi gunehbariya tijî
aso di qêrînên bêsûd de
ez ji kêliyên xwe qut bûm dîsa
tu nehatî
dem bi ser xewnên min de verişî
û min bi destê xwe
ser mirinên xwe nixûmandin

xweziyên kefenê terikandinê li xwe rabestan
dawiya gêjgerînkên min bêderî bûn
hîna hêrsê dihêrim li ser sînga xwe
termekî siya xwe miz dida
bi êşeke pixûdîn
li ber straneke kevinbûyî

tiştekî ez winda bikim nemabû
salnameyan hêviyên min cûtin
dil birînên herî xedar girtin
dengek ji vî zimanê sarbûyî derneket
diricifîn gotinên bêcoş
ez
di
şerê
bendemayînan
de
mêzixîm

zêmarên ku
ji tenêtiya min dawerivîn
bi agirê hezkirinekê keliyabû dilê min
evîn wek artêşeke bizdonek
dê stûyê xwe xwahir bike
li ber hestên ji kêrê tûjtir


tu yê bibîne delala min
xiyaneta sibehên bixwîn
êşên bêrehm
û di nav helbestek sotî de
kovaniyên me
lê dê çav rûçikên heyva şermok biramûsin
ez ê eşqa dilekî bêqeyd
ji te re bînim ziman
bi rengê biharê
bi şewqa ku ji bedewiya çavên te
vedibeyî ser gotinan

## GOTINÊN MITRÎ

bayê ku bêhna evînekê li xwe rabesta
dixayîsin newayên dilsoj
di sibeheke bêronî ya hêjivî de
dem wek tariyeke pînî
li qelebalixekê gelicîbûn gotin
dil sûket
dil şikestî
ji wan çûyînên te yên bêveger

û ev hestên ku
bi xweşikiya çavên te terişîn
serpêhatiyek bêmişwer
mîna dalaneke nepen bû
awir li te
ji seqerê sartir

dê nehêvişiya ba helbet ev çîrok
li tu pejan û rawestgehê
bes bêzar im
ji nebûna xwe ya dilzar
û ji gotinên mitrî



siya ku ket ser behrê
keştiyên li dilopan qelibîn
û ev fermana dawî ya xwedê
devê xencera min bixwîn, dimeşim
di devê min de
tehma çîroka bikovan a xwekuştinê
rê winda bûn li asoyan

tu hestê fêm nekir
birîna li dil veşartî
ji ber vê xeyîdîbûn peyv
kujende bûn awir
ji ber vê kelogirî bûn baran
ji tenêtiya heyva min re

ISBN: 978-605-81463-9-6
9 786058 146396